

JAG
VILL
VETA

MIN DIVÊ BIZANIBIM

SÛC, DESTEK Û ALÎKARÎ
ÇAWA TÊ KIRIN

www.jagvillveta.se

LI SWÊDÊ GELEK ZAROK TÛŞÎ SÛCAN TÊN.

Li Swêdê gelek zarok tûşî suncan tên. Sûc bo nimûne dikare li mal, li dibistanê, li pêşdibistanê yan jî ser Internetê rûbide. Lêxistina zarokan, dehdan, gefxwarin yan jî dijûn hin ji suncan in. Wekî din jêstandina tiştên zarokê, mirov nehêle zarok behsa sêceki bike, yan jî salmezinek li hember zarokekê destdirêjiya cinsî bike çend mînak ji suncan in.

Carna dikare zehmet be mirov bizanibe bûyer sêc e yan na û hingî baş e mirov bi salmezinekî re bipeyive. Bûyereke ku ne sêc jî be carna dikare bi mirov zehmet be û mirov pê nerihet bibe.

Eger kesek te nerihet bike, kiryar sêc be ne sêc be ew kes xeletiyê dike û mafê her zarokî ye ku alîkariyê wergire. Di vê broşurê de tê nivîsandin bê tu dikarî alîkarî û destekê ji kû wergirî.

Eger tu bixwazibî li ser suncan cihêreng yê li hemberî zarokan û alîkariyê bixwînî bikeve malpera www.jagvillveta.se de.

MIROV NERIHET DIBE

Eger mirov tûşî sûcekî hatibe mirov dikare xemgîn bibe, bitirse yan jî hêrs bibe.

Sûcek dikare wek nimûne wiha li mirov bike:

- ser yan zikê mirov diêşe
- mirov nikare raze
- xewnerêşkan dibîne
- nikare baş bixwe yan jî bi yek carê zêde dixwe
- bê ku mirov sebebê bizanibe laşê mirov têşe
- li dibistanê nikare xwe konsantre bike
- pev diçe.

MIROV
NERIHET
DIBE

BI HINE- KAN RE BIPEYIVE

**EGER KES GUHDARÎ
NEKE: DÎSA BÊJE.**

Dibe ku zehmet be tu behsa sûcekî ku tu tûşî wê hatiye bikî. Lê dîsa jî hewl bide ji hinekan re bêje. Bi gotin û behskirinê mirov baştir dibe.

Carina mirov dikare bi kesekî ji malbata xwe yan jî hevalekî xwe re dilê xwe veke. Eger tu nexwazibî bi kesekî ku tu ji nêzîk ve nasdikî re biaxivî tu dikarî ji kesekî li dibistanê re dilê xwe vekî. Bo nimûne tu dikarî bi mamosteyek ku tu jê hez dikî, şewirmend yan jî hemşîreya dibistanê re biaxivî.

Eger kes guhdarî neke: dîsa bêje.

Hin salmezin ne baş guhdarî dikin ne jî zarokan fam nakin. Eger te ji kesekî re behs kiribe lê rewş baştir nebûbe, baş e ku tu bi kesekî din re jî bipeyivî. Bipeyive heta ku salmezinek guhdarî bike.

TU DIKARÎ LI BRIS BIGERÎ- EW DIXWAZIN ALÎKARIYA TE BIKIN

Tu dikarî telefonê bidî BRIS û bi salmezinê ku wezîfeya wî axavtina bi zarokan re ye bipeyivî.

Hejmara telefona BRIS 116 11.

Gelek zarok gava nerihetin yan jî tiştek rûdide li BRIS digerin.

Dema tu telefonê didî nepêwist e tu navê xwe bidî, yan bibêjî bê tu li kû dijî. Lêgerîna BRIS belaş e û di fatureya telefonê de nayê dîtin ku tu li BRIS geriyaye. Eger tu nexwazibî hejmar di telefona te bi xwe de bimîne piştî axavtinê hejmarê ji telefona xwe jî bavêje.

**KÎ ALÎKARIYA
ZAROKAN DIKE
Û WAN DIPARÊZE?**

Gelek meqamên ku alîkariya zarokan dikin û wan diparêzin hene. Li meqamekî ji van tu ji kesekî re behs dikî bê çi hatiye serê te. Eger tu ji wan re bêjî ku kesekî zorî li te kiriye û tu nerihet kiriye ew mecbûr in guhdariya te bikin û alîkariyê bidine te. Bo nimûne tu dikarî bi karmendekî sosyalê re, bi psîkiyatîrîya zarok û ciwanan re, bi stargeha zarokan Barnahus yan jî bi Polîs re bipeyivî.

XIZMETA CIVAKÎ LI HEMÛ ŞAREDAARIYAN HEYE

Xizmeta civakî (sosyal) li hemû şaredariyên Swêdê heye. Wezîfeya wan ew e ku li hemberî şidetê destekê bidine te û te biparêzin. Eger xizmeta civakî pê bihese tu acizî yan jî tûşî şidetê hatiyî pêwîst e ew binêrin bê çi alîkarî ji te re lazime.

PSÎKIYATRÎYA ZAROK Û CIWANAN (BUP) DIKARE ALÎKAR BE

Ji ber sedemên cuda zarok têkiliyê bi BUP re dideynin. Bo nimûne piştî rûdana sûcekî dibê ku mirov nerihet bûbe. Li BUPê kesên ku fêr bûne bi zarokan re bipeyivin kar dikin.

LI 'BARNAHUS' TU DIKARÎ BEHSA SERPÊHATIYÊ BIKÎ

Li gelek bajarên mezin stargehên zarokan Barnahus hene. Eger kesekî tahde li zarokê kiribe zarok tê vira ji polîs yan jî karmendê sosyalê re behsa serpêhatiyê dike. Li Barnahus eger pêwîst be mirov dikare doktor jî bibîne.

POLÎS LI SER SÛC HÛRNÊRÎNÊ DIKE

Eger mirov tûşî sûcekî bûbe baş e mirov li cem polîs gilî bike. Hingî polîs lêhûrnênekê dike bê çi bûye. Eger kesekî ji malbata te tu êşandibî polîs xizmeta civakî (sosyalê) agahdar dike da ew jî alîkariya te bikin.

WWW.JAGVILLVETA.SE

Di malpera www.jagvillveta.se de tu dikarî agahiyên li ser sÛcên cuda, destek, alîkarî û hestên ku piştî sÛc tene mirov pirtir bixwînin. Li wir serpêhatî û pêşniyazên zarokên ku tûşî sÛcan bûne jî hene

TU DIKARÎ
LI VIR BIGERÎ
YAN JÎ
E-NAMEYÊ
BIŞÎNÎ:

RÊXISTINÊN IDEEL

Di Civakê de mafê Zarokan, BRIS

BRIS-telefon: 116 111

www.bris.se, www.barnperspektivet.se

**Federasyona Nobedariyên mexdûrên
Sûcan BOJ**

Telefona nobedariyê: 0200-21 20 19

unga@boj.se, www.ungabojoj.se

**Rêxistina Parastina Zarokan
- Râdda Barnen**

Tel: 08-698 90 00

info@rb.se

www.rb.se

Tjejjouren.se

MEQAM Û MERCIYÊN DIN

Nûnerê zarok û xwendekaran li

Çavdêriya dibistanê, BEO

Tel: 08-586 080 00

beo@skolinspektionen.se

www.skolinspektionen.se

Polis

Tel: 114 14

Di rewşa dijwar de: 112

www.polisen.se

Miayenexaneyên ciwanan

Agahiyên têkiliyê yên gişt miayenexaneyên

ciwanan di vê malperê de peyda dibin:

www.umo.se

Xizmeta civakî

www.skl.se

Ji bo agahiyên têkiliyê yên xizmeta civakî

(sosyalê) li şaredariya te girêdanka şaredarî û
wîlayetan (Kommuner och landsting) bitikîne.



BROTTSOFFERMYNDIGHETEN

Box 470, 901 09 Umeå

Tel: 090-70 82 00

registrator@brottsoffermyndigheten.se

www.brottsoffermyndigheten.se

© Brottsoffermyndigheten, 2014
Produktion Plakat
Åströms Tryckeri AB, Umeå 2014

Meqamê mexdûran ji bo
baştirkirina rewşa zarok û
salmezinên ku tûşî sûcan
hatine dixebite.

Eger tu bin 18 salî re yî di mal-
pera **www.jagvillveta.se** de tu
dikañî li ser mafê xwe, desteka
tu dikañî wergirî û bê pêvajoya
dadgehê çawa ye bixwîñî.